TU JI BÎR MEKE QET

Fatma Savcî

Ji çîyayê xemrîn dipirsim Helepçe
wê dema ku şeveq xewirî
Di zerka çavên me de..
Di wê roja
ku tiq tiqa kenê mirinê bû
li ser lêvên zarokan..
Di wê şeva berzeyî de
Ku heyvê xwe di şerîda
Û stêr yeko yeko di çilmisîn
Li ezmanê sibeyên me..
Îcar me yê li ber çoka kîjan xwe-
dayan rûnîştana
Û dilê xwe jêra vekirina?
Ya li zora min diçe
Ne mirine Helepçe
Ji kûştina ne bîyanim
Birînên minî bêxwîn
Çûyinên bê lorîk
Xinêzîya kemînên jehrê ye
Ya ku hîna min dikûje
Hîn bû me ku li ber sîya çîya
bimrim
Pişta min li zinarekî
Di bin dara gwîzekê de
Dî hembêza min de kelêşek
westîyayî
Di bêrîka min da jî kûlîlkek tî..
Min tim şerim kiriye vezilim

Li ber bejna yara xwe
Di hembêza min de zarokek şîrmî
Çawa xwe niqandin hewar
Di jewîyên me de
Lê bûn qûdusên hemî zardeştan
Em bi bêdengî yê re
Bî bayê kaderê re
Çawa bi serê xwe man?
Ew çi agirê bê şewq bu
Ku xeyalên me jehrî kirin
Û di kolana jîyana me ya nînkûştîre bûhûrîn..
Dîsa ku her yek ji me mir Helepçe
Li deştek bê stargeh
Li her evraz çîya
Xwîn degûlek pişkikjî
Û dest bi girîkir Helepçe
Tu ji bîr meke qet
Ku em li te kûştin Helepçe
Li her derê cihanê birîndar man dîsa em
Bi xweyalên xwe yê azadîyê re..